Artuklu Kurdology
e-ISSN: 3062-0236
(19) March 2025

Realîzma Sosyalîst û Minetdariya li Hemberî Sovyetan di Romanên Hopo û Jiyana Bextewar de[1]

Hopo ve Jiyana Bextewar Romanlarında Sosyalist Realizm ve Sovyetlere Duyulan Minnettarlık

Socialist Realism and Gratitude Towards the Soviets in the Novels Hopo and Jiyana Bextewar

Hüseyin KAR

https://orcid.org/0000-0002-3344-982X| huseynelif1@gmail.com
Xwendekarê Lîsansa Bilind, Zaningeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê,
Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Tirkiye
ROR ID: https://ror.org/0396cd675

Jêgir *Citation* Atıf	Kar, H. (2025). Realîzma Sosyalîst û Minetdariya li Hemberî Sovyetan di Romanên Hopo û Jiyana Bextewar de. *Artuklu Kurdology* (19). 17-32 DOI:10.35859/artuklu kurdology.1641642.
Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	17.02.2025
Dîroka Qebûlê *Acceptance Date* Kabul Tarihi	26.03.2025
Dîroka Weşandinê *Publication Date* Yayın tarihi	30.03.2025
Cureyê Gotarê ***Article Type*** **Makale Türü**	Gotara vekolînê Research article Araştırma makalesi
Hakemtî **Peer-Review** **Hakemlik**	Cot Nenas – Du ji derve Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
Beyana Etîk ***Ethical Statement*** **Etik Beyanı**	Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin *It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.* Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
Kontrola Întihalê ***Plagiarism Checks*** **Benzerlik Kontrolü**	Belê – İntihal.net *Yes – İntihal.net* Evet – İntihal.net
Nakokiyên Berjewendiyan ***Conflicts of Interest*** **Çikar Çatışması**	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti alîyên din nakokîya berjewendîyê tune ye. *There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.* Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Alîkarîya Darayî ***Grant Support*** **Maddi Destek**	Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine. *The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.* Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telîfê & Destûr *Copyright & License* **Telif Hakkı & Lisanslama**	Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. *Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.* Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.
Agahîyên Îndeksan ***Indexing*** **Dizinleme Bilgisi**	DOAJ, ErihPlus, MLA, ProQuest, Linguistic Bibliography

1 Ev gotar ji teza nivîskar a bi serenavê "Têgeha 'Emrê Teze' di Romanên Kurdî yên Sovyetê de" hatiye hilberandin.

Kurte

Realîzma sosyalîst, doktrîneke polîtîk a edebî ye ku di 1934an de ji aliyê Sovyetan ve bi awayekî fermî hatiye qebûlkirin û li ser nivîskarên Sovyetê hatiye ferzkirin. Li gor vê doktrînê, divê nivîskar wekî endezyarên civakê tev bigerin û berhemên xwe li gor wê binivîsinin. Di edebiyata kurdî ya Sovyetê de, Erebê Şemo, yekem ji wan kesan e ku berhemên xwe bi rê û rêbazên realîzma sosyalîst dinivisîne. Ew di berhemên xwe de cih dide neçarî û hejariya karker û gundiyan û paşê wan bi sosyalîzmê digihîjîne zanîn, kêfxweşî û rehetiyê. Lehengên berhemên wî, ji ber vê yekê tim û dayîm minetdarê Sovyetan in. Her wiha ew, fedakar û nobedarên pergala nû ne. Erebê Şemo, di her du romanên xwe *Hopo* **û** *Jiyana Bextewar* de prototîpa "insanên nû yên Sovyetê" destnîşan dike. Di van romanên xwe da axa, beg û kedxuran mehkûm dike, Lenîn û dîwana Sovyetê hêjayî pesnan dibîne. Ev xebat li ser jiyana Erebê Şemo, berhemên wî û nîşaneyên realîzma sosyalîst di her du romanên wî *Hopo* û *Jiyana Bextewar* de, disekine. Her wiha di van her du romanên navborî de şopên minetdariya pergala Sovyetan vedikole û analîz dike.

Bêjeyên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Sovyetê, Realîzma Sosyalîst, Erebê Şemo, Jiyana Bextewar, Hopo

Xalên Sereke:

- Erebê Şemo, di romanên xwe *Hopo* û *Jiyana Bextewar* de, bi rêbazên îdeolojîk ên realîzma sosyalîst, kurdên Sovyetê digihîjîne aramî û rehetiyê û wan dike minetdarên Sovyetê.
- Erebê Şemo, hem wekî nivîskarekî kurd û hem jî wekî kesayetek, bi awayekî sîstematîk di xizmeta siyaseta Sovyetê de cih digire.
- Di *Hopo* û *Jiyana Bextewar* de karakterên wekî Emerîk, Sehîd, Hesen û Zînê, mînaka "insanên nû yên Sovyetê" ne ku ew ji bo pêşxistina civaka sosyalîst dixebitin.
- Di *Hopo* û *Jiyana Bextewar* de Sovyet, wekî hêzekê ku kurdan ji zordariyên feodal û dewletên serdest rizgar kiriye tê nîşandan û ev yek dibe sedema minetdariya kurdan li hemberî Sovyetan.

Öz

Sosyalist realizm, 1934 yılında Sovyetler tarafından resmi olarak kabul edilen ve Sovyet yazarlarına dayatılan politik ve edebi bir doktrindir. Bu doktrine göre, yazarlar toplumun mühendisleri gibi davranmalı ve eserlerini buna göre yazmalıdır. Sovyet Kürt Edebiyatı'nda, Erebê Şemo, eserlerini Sosyalist Realizm'in yöntemleriyle yazan ilk yazarlardandır. Eserlerinde işçi ve köylülerin çaresizliğine ve yoksulluğuna yer verir, onları sosyalizmle bilgi, mutluluk ve rahatlığa ulaştırır. Bu nedenle, eserlerinin kahramanları Sovyetler'e her zaman minnettardır. Ayrıca onlar, yeni sistemin fedakar ve sadık savunucularıdır. Erebê Şemo, her iki romanı olan *Hopo* ve *Jiyana Bextewar*'da "yeni Sovyet insanı" prototipini ortaya koyar. Bu romanlarında toprak ağalarını, beyleri ve işverenleri mahkum eder, Lenin ve Sovyet sistemini övgüye değer bulur. Bu çalışmada, Erebê Şemo'nun hayatı, eserleri ve her iki romanı olan *Hopo* ve *Jiyana Bextewar*'daki sosyalist realizmin izleri incelenmektedir. Ayrıca, bu iki romanda Sovyet sistemine minnettarlığın izleri araştırılmakta ve analiz edilmektedir.

Anahtar Kelimeler: Sovyet **Kürt Edebiyatı**, Sosyalist Realizm, Erebê Şemo, Jiyana Bextewar, Hopo

Öne Çıkanlar:

- Erebê Şemo, *Hopo* ve *Jiyana Bextewar* romanlarında Sovyet Sosyalist Realizmi'nin ideolojik araçlarını kullanarak Sovyet Kürtleri'nin Sosyalizmle kurtuluşunu ve sisteme bağlılığını yansıtır.
- Erebê Şemo, hem bir Kürt yazarı hem de kişilik olarak, sistematik bir biçimde Sovyet siyasetinin hizmetinde yer edinir.

- *Hopo* ve *Jiyana Bextewar* romanlarında Emerîk, Sehîd, Hesen ve Zînê gibi karakterler, Sosyalist toplumun gelişimi için çalışan "yeni Sovyet insanı" örnekleridir.
- *Hopo* ve *Jiyana Bextewar* romanlarında Sovyetler, Kürtleri feodal zulümlerden ve egemen devletlerden kurtaran bir güç olarak tasvir edilir; bu durum Kürt toplumunda Sovyetlere karşı derin bir minnettarlık duygusuna yol açar.

Abstract

Socialist realism is a political and literary doctrine officially adopted by the Soviets in 1934 and imposed on Soviet writers. According to this doctrine, writers should act as engineers of society and write their works accordingly. In Soviet Kurdish literature, Erebê Şemo is one of the first writers to compose his works using the methods of socialist realism. In his works, he addresses the helplessness and poverty of workers and peasants, and then leads them to knowledge, happiness, and comfort through socialism. The heroes of his works are therefore always grateful to the Soviets. Moreover, they are devoted and loyal defenders of the new system. In both of his novels, *Hopo* and *Jiyana Bextewar*, Erebê Şemo presents the prototype of the "new Soviet man." In these novels, he condemns landowners, beys, and employers, while praising Lenin and the Soviet system. In this study, the life of Erebê Şemo, his works, and the traces of socialist realism in both of his works, *Hopo* and *Jiyana Bextewar*, are examined. Additionally, the traces of gratitude towards the Soviet system in these two novels are explored and analyzed.

Keywords: Erebê Şemo, Socialist Realism, Kurdish Literature, Hopo, Jiyana Bextewar, Soviet Kurdish Literature

Highlights:

- Erebê Şemo, in his novels *Hopo* and *Jiyana Bextewar*, employs the ideological tools of Soviet socialist realism to depict the liberation of Soviet Kurds through socialism and their allegiance to the system.
- Erebê Şemo, establishes himself both as a Kurdish writer and as a personality, systematically positioning himself in the service of Soviet politics.
- In *Hopo* and *Jiyana Bextewar*, characters like Emerîk, Sehîd, Hesen, and Zînê exemplify the "new Soviet man" who works for the advancement of socialist society.
- In *Hopo* and *Jiyana Bextewar*, the Soviets are depicted as a force that liberated Kurds from feudal oppression and dominant states, which creates profound gratitude among the Kurdish people toward the Soviet Union.

Destpêk

Şoreşa ku di 25ê Cotmeha sala 1917an de li Ûrisetê pêk hat, derfetên mezin li ber xebatên kurdî vekirin. Xebatên ku ji wê demê heta hilweşîna Sovyetê dewam dikin, wekî Edebiyata kurdî ya Sovyetê tê binavkirin. Di vê çarçoveyê de berhemanîna ewil bi çêkirina elîfbayên kurdî ye. Di sala 1931ê de li Zanîngeha Lenîngradê di bin banê beşa Îranolojiyê de binbeşa kurdî tê damezirandin. Li vir zanyarên kurd û biyanî li gel hev dixebitin û nivîskarên kurd ên wekî Erebê Şemo (1897-1978) û Qanadê Kurdo (1909-1985) derdikevin pêş. Di sala 1934an de Kongreya Yekemîn a Kurdolojiyê tê lidarxistin. Dîsan li Taşkentê di sala 1957an de Kongreya Hemû Rojhilatnasên Ûrisetê dicive û kurdologên ûris lêkolînên xwe yên der barê kurdolojiyê de parve dikin. Di sala 1958an de li beşa rojhilatnasiyê ya Akademiya Zanistî ya Ermenistanê ligel xebatên der barê miletên Rojhilatî de, xebatên bi kurdolojiyê re têkildar jî tên kirin. Piştî vê rûdanê bi salekê, di 1959an de li Lenîngradê beşa kurdolojiyê tê avakirin. Ev beş, ji avakirina Sovyetê heta hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, bûye navenda lêkolînên kurdolojiyê (Alakom, 1991, r. 111-115).

Edebiyata kurdî ya Sovyetê, heta dawîyê jî, li gel guhertinên demkî, hema bêje bi temamî li ser rêçekê ye û bi taybetmendiya xwe ya çandî, civakî û sîyasî, her çiqas mecbûrî be jî, vê rêça xwe diparêze. Mîna ku Ergün jî diyar dike, ev edebiyat, ji ber hinek sedemên diyar, wekî edebiyateke yekdeng û yekreng xuya dibe û heta demeke dirêj li ser xeteke berçav tê berhemanîn. Nebûna çavkaniyeke edebî ya kritîk, xwespartina folklorê, travmaya etnîkî, pêwendiya bi îdeolojiyê re û serdestiya rêbaza realîzma sosyalîst dibin sedem ku ev edebiyat li dora anonîmiyeke civakî bizivire û heta asteke baş wekî edebiyateke hevşêwe derkeve holê. Bêguman, dema ku folklor, anonîmî, îdeolojî û rêbaza civakî ya edebiyatê tên berhev, derfetên ji bo xeyalên alternatîf, wêneyên şexsî, deng û rengên cuda û lêgerîna şêwazên nû yên derbirînê gelek kêm dibin (Ergün, 2022, r. 150). Lê dîsan jî her çiqas ev rastiyeke giring be jî, di vê êwrê de ji destpêkê heta îro, bi dehan pirtûkên kurdî hatine weşandin, radyo û dibistanên kurdî hatine vekirin, fîlm hatine çêkirin, werger hatine kirin, komên şanoya kurdî hatine sazkirin û hwd. Di van kiryaran de armanca sereke her **çiqa**s propagandaya komunîzmê be jî, ev derfeta zêrîn ji bo kurdan guherîn û pêşketineke rasterast pêk tîne. Kurdên ku koçer, gundî û belengaz in bi perwerdekirinê dikevin ber bayê guherînê. Bi vî bayî re dibin xwende, rewşenbîr û nîvîskar. Bi vî awayî êwra edebiyata kurdî ya Sovyetê şitil dide. Di vê **ê**wrê de romana kurdî ya ku bi Erebê Şemo dest pê dike, bi Eliy**ê** Evdilrehman, Heciyê Cindî, Ahmedê Hepo, Sehîdê Îbo, Egîtê Xudo, Wezîrê Eşo, Ezîzê Gerdenzerî, Eskerê Boyîk û Tosinê Reşîd dewlemendtir dibe. Bi destê van nivîskaran, nêzîkî hevdeh heb roman**ê**n **k**urdî yên ewilîn tên nivîsandin.

Erebê Şemo, nîvîskar û rewşenbîrê ji nifşa ewil a edebiyata kurdî ya Sovyetê ye ku nivîskarê romana yekem a edebiyata kurdî ye jî. Şemo, di romanên xwe yên bi navê *Jiyana Bextewar* û *Hopo* de, der barê kurdan de behsa demên xweş ên piştî şoreşa sosyalîzm**ê** dike. Erebê Şemo, bi hilkefta bûyer û karakterên van romanan, pesindariya rejîma Sovyetê dike û ji bo destkeftinên şoreşê, minnetdariya gelê kurd tîne zimên. Ji aliyê nivîskar û rewşenbîrekî kurd ve helwesteke wiha, ku ev helwest ji edebî bêhtir helwesteke polîtîk e, hêjayî lêkolîn û dahûrandinê ye. Ji ber vê yekê ev xebat hewl dide ku, minnetdariya kurdan li hemberî rejîma Sovyetan vekole.

Xebat, ji sê beşan pêk tê; beşa yekem, li ser jiyan û kesayetiya edebî ya Erebê Şemo û berhemên wî disekine. Beşa duyem li ser teoriya Realîzma Sosyalîst disekine, her wiha têkiliya vê teoriyê bi edebiyata kurdî ya êwra Sovyetê re dinirxîne. Beşa sêyem li ser mijara sereke, Realîzma Sosyalîst di romanên *Jiyana Bextewar* û *Hopo* de disekine. Di xebatê de wekî berxebat û çavkanî, romanên nivîskar *Jiyana Bextewar* û *Hopo* hatin hilbijartin; ji ber ku ev her du berhem, şopên minetdariya li hemberî Sovyetan karakterîze dikin û daneyên rênîşander dihewînin.

1. Jiyan, Berhem û Kesayetiya Edebî ya Erebê Şemo

1. 1. Jiyan û Berhemên Wî

Erebê Şemo, bi navê xwe yê fermî Ereb Şamîlov, di 23yê îlona 1897an de li gundê Sûsizê hatiye dinyayê. Ev gundê êzidî li ser Dîgora Qersê ye. Navê Bavê wî Şemo bû, loma jê re digotin Erebê Şemo. Ji ber ku rewşa wan a aborî ne baş bû, bavê wî gavantî û xulamtî dikir (Boyîk, 2019, r. 124). Ereb, vê rewşa bavê xwe di romana Şivanê Kurmanca de tîne zimên: *Diçû ber dewarên xelkê. Wî li wê qezaya kurdan, li gundên Molokanan, Adirbêcana, Huruman û Ermenan rêncberî dikir. Salekî şivan bû, sala dî gavan û bi teherekî ebûra zarokên xwe dikir (Şemo, 2009, r. 53).*

Ereb, ji biçûkatiyê ve ji bo alîkariya bavê xwe bike, gavantiyê dike. Demekê li dibistaneke ûrisan dibe dergevan. Bi alîkariya keça mamosteyê dibistanê hînî rûsî dibe. Bala mamoste dikişîne ser xwe, mamosteyê dibistanê, wî wekî xwendevan qebûl dike. Ji bo dabînkirina aboriya xwe di malên dewlemendên ûris, ermen, azerî, tirk û gurciyan de dixebite û bi vê hilkeftê fêrî ziman û çanda wan dibe (Boyîk, 2019, r. 125).

Ji ber zanîna zimanan di şerê osmanî û ûrisan de bi qasî çend mehan wergêriya ûrisan dike. Di rêya hesinî de dixebite, li wir rastî fikrên şoreşgerî tê û tev li komên şoreşger dibe. Ji ber ku di mitîngekê de diaxive û di axaftina xwe de doza mafên xebatkaran dike, demeke kurt di girtîgehê de dimîne. Gava li bajarê Ûrisetê, Stavrapolê ye, şerê navxweyî dest pê dike, Li kêleka Bolşevîkan şer dike û birîndar dibe. Piştî qenc dibe, dest bi xwendina bilind dike (Xelîl, 2014, r. 93). Paşê diçe Moskovayê, xwendina xwe li wir didomîne. Di 1924an de vedigere Ermenistanê û tev li Navenda Partiya Komunîst dibe (Boyîk, 2019, r. 127). Hikûmeta Ermenistanê ji bo asta perwerdeya gel pêş bixin mamosteyan dişînin gundan û xwendin û nivîsandinê hînî wan dikin (Reşan, 2008, r. 144). Erebê Şemo jî di vî karî de peywirdariyê dike û her wiha der heqê jiyana kurdan de, di rojname û kovaran de nivîsaran dinivîse.

Şemo di sala 1928an de bi bi alîkariya Îshak Maragulov elîfbayeke kurdî bi tîpên latînî amade dike. Navê vê elîfbayê *Xo Xo Hînbûna Xandina Nivîsara Kurmancî* ye (Şamil, 2005, r. 94). Di sala 1928an de bi înîsiyatîfa Erebê Şemo komeke ciwanên kurd tên Lenîngradê. Ew ciwan, piştî xwendina xwe vedigerin nav gelê xwe û xizmeta wan a ziman û çandî dikin. Şemo bi nivîskar, rewşenbîr û siyasetmedarên wê demê re radibe û rûdinê. Ji bo rewşa kurdan bîne ziman, ew diçe cem Lenîn, bi wî re hevdîtinê dike (Boyîk, 2019, r. 132). Erebê Şemo, ji bo rojnameya *Riya Teze* jî roleke mezin dilîze. Ev rojname, di sala 1930î de li Yêrêvanê dest bi weşanê dike. Şemo, yek ji rêvebirên rojnameyê yê herî çalak bû (Boyîk, 2014, r. 10). Belavok*ên* bi navê *Emirê Lenîn*, *Terîqa Rêvolûsiya Oktyabirê* û *Kolxoz û Kara Wê Gundiya Ra* dinivîse. Paşê ji bo komên şanoyê yên gundên kurdan şanoya Aleksander Araratyan ya bi navê *Koçekê Derewîn* werdigerîne bi kurdî. Li dû wê jî romana xwe ya navdar Şivanê Kurmanca dinivîse. Di 1936an de bi navê *"Kurdê Elegezê"* pirtûkeke çîrokan dinivîse (Boyîk, 2019, r. 130).

Di sala 1935an de piştî mirina Lenîn rojên xerab careke din dest pê dikin ji bo kurdan. Stalîn tê ser rêvebiriyê û bi awayekî zalimane tev digere. Ew rê li pêşiya kurdan û kurdî dibire, berê wan dide sirgûnê. Erebê Şemo jî sirgûnî Sibîryayê dibe. Di 1955an de, du sal piştî mirina Stalîn, ew tê berdan û vedigere Yêrêvanê. Ew ji nû ve dest bi xebatên xwe yên nivîsandinê dike. Şemo di Radyoya Yêrêvanê de dixebite, bernameyan çê dike, sê romanên din dinivîse. Ew di sala 1959an de *Jiyana Bextewar*, di sala 1969an de jî *Dimdim* û *Hopo* dinivîse (Boyîk, 2019, r. 134, 138). Erebê Şemo, di sala 1978an de, li Yêrêvanê diçe ser dilovaniya Xwedê.

1.2. Kesayetiya Wî ya Edebî

Erebê Şemo, nivîskarekî realîst sosyalîst e. Ew berhemên xwe li gorî fikra xwe ya siyasî, yanî realîzma sosyalîst dinivîse. Li gorî realîzma sosyalîst di berheman de karakterên îdealîzekirî tên teswîrkirin. Karakterên romanên wî bibiryar û rasterast in (Ahmedzade, 2011, r. 49). Ev rêbaz, ne tenê di teswîrkirina lehengan de, di honandina romanan de jî derdikeve pêş. Bûyerên ku Şemo ji bo berhemên xwe hilbijartine yan beşek ji jiyana wî ne yan jî serpêhatiyên kesên din in ku ew bûye şahidê wan. Di romanên wî de bawerî heye, ji ber ku îdealîzm her li pêş e. Mîna romanên klasîk ên sedsala nozdehan, lehengên xwe ji nava rastiya jiyanê diafirîne. Şemo di romanên xwe de bûyeran derdixe pêş û tehlîlên psikolojîk gelekî kêm in.

Erebê Şemo, wekî hemû nivîskarên kurd ên Sovyetê, di berhemên xwe de zimanekî sade yê axaftina rojane bi kar tîne (Boyîk, 2019, r. 137). Nivîsandina bi zimanê sade û herêmî, rêgezeke sereke ya realîzma sosyalîst e. Di realîzma sosyalîst de edebiyat ji bo perwerdekirina gel tenê amûrek e; ji ber vê yekê jî di berhemanînê de ji hunerê zêdetir giringîpêdayîna dîdaktîzmê li pêş e. Zimanê xwerû di vê edebiyatê de her çiqas giring be jî, zimanê rojane bêhtir giring e. Peyvên ku ji zimanên erebî, tirkî, farsî, ermenî û rûsî ketine nav axaftina kurdî ya rojane, gelekî hatine bikaranîn. Ji ber ku di nivîsandina van berheman de armanca sereke ne huner e, bi rêya van berheman tê xwestin ku propagandaya rejîmê bê kirin û îdeolojiya komûnîzmê li nav milet zûtir bê belav kirin; lewma ev peyvên biyanî ji zimanê edebiyatê nehatine mehrûmkirin (Ahmedzade, 2011, r. 39).

Di hemû romanên Şemo de haya vegêr ji hemû bûyeran heye, ew hemû qewimînan dibîne û dizane. Ev vegêriya îlahî, ku Erebê Şemo her tim bi kar aniye, di gelek romanên kurdî yên pêşîn de jî heye (Ahmedzade, 2011, r. 38). Mijarên romanên Şemo (*Hopo* ne tê de), her tim di demên şer û pevçûnên giran de derbas dibin: Li aliyekî şerê di navbera dewletên serdest de ku kurd her tim di navbera wan de dimînin, li aliyê din jî şerê di navbera milkdarên zalim û belengazan de. Ji ber ku ew bi xwe di nav de bû û bûyerên wê demê bi xwe jiyabû, pevçûn û guherînên mezin ên di romanên xwe de bi hostatî vedigêre. Ew di nivîsandina romanên xwe de hem ji bîranînên xwe hem jî ji xwendin û bihîstinên xwe sûd werdigire.

2. Teoriya Realîzma Sosyalîst û Têkiliya Wê bi Edebiyata Kurdî ya Sovyetê re

2.1. Teoriya Realîzma Sosyalîst

Mirov dikare edebiyata kurdî ya Sovyetê di nav edebiyata giştî ya Sovyetê de wekî beşeke biçûk qebûl bike ku ev edebiyat li gorî taybetmendiyên realîzma sosyalîst ava bûye. Di bin çarçoveya polîtîk a Sovyetê de, tu derfet ji bo çêkirina edebiyateke cuda tunebû; kontrola rejîmê, bi sansûreke giran li ser hemû cureyên weşanan hebû. Ji ber vê yekê, edebiyata kurdî ya Sovyetê wekî naverok û şêwaz bi tevayî li gorî îdeolojiya Sovyetê saz bûye ku ev jî teoriya realîzma sosyalîst e. Li ser vê binyadê, edebiyata kurdî ya Sovyetê bi piranî ji aliyê komeke kurdên êzîdî ve hatiye berhemanîn ku di encama şerên dirêj ên di navbera împeratoriyên Ûris û Osmanî de xwe li ûrisan girtibûn. Bi vê sedemê, ev edebiyat xwe li ser sosyolojiyeke diyar a kurdewarî datîne, ku rû û rûçikên komeke etnîkî ya paşdemayî jê xuya ye(Ergün, 2017, r. 645). Di vê edebiyatê de, têkiliyên civakî, dîrokî û çandî yên kurdên êzîdî bi awayekî berbiçav têne nîşandan. Bi vî rengî, ev edebiyat ne tenê qeydeke çandî û zimanî ye, lê di heman demê de şahidê guhertinên mezin ên dîrokî û civakî ye, ku vê koma etnîkî, di navbera du împeratoriyên mezin de ew tecrube kiriye. Loma, edebiyata kurdî ya Sovyetê ne tenê wekî beşek ji edebiyata Sovyetê, lê wekî dîmeneke taybet ji çanda kurdî jî tê dîtin.

Binaxeya realîzma sosyalîst a felsefîk digihîje felsefeya marksîst, ya polîtîk digihîje tevgera Bolşevîzmê û ya estetîk û edebî jî digihîje edebiyata rûsî ya klasîk. Binaxeya herî kevin a realîzma sosyalîst jî digihîje nivîskar, feylesof û rexnegirê ûris N. G. Çernişevskî (1828-1889) ku, ew li ser

têgihîştina vê hunerê sekiniye û berhemên xwe li ser estetîka vê teoriyê daniye. Çernişevskî, di 1855an de teza xwe ya doktorayê bi navê *Boçûna estetîk a hunerê ber bi rastiyê ve* parastiye. Fikra sereke ya vê tezê ev e: "Ya xweşik, jiyan bi xwe ye." Her wiha li gorî Çernişevskî "jiyan, bi awayê ku em dixwazin wê bibînin xweş e." Ev hevok, bi temamî binyada estetîka marksîst pêk tîne. Çernişevskî, vê têgihîştina estetîka xwe di romana xwe ya bi navê Şto D*yelat?* (Çi Bikin?*)* de xwestiye bi awayekî pratîkî nîşan bide. Wî di vê romana xwe de hêza edebiyatê ya li ser siyaset û perwerdeyê destnîşan kiriye. Lehengê Çernişevskî, ewil pirtûkan dixwîne xwe bi pêş dixe, piştre bi rêya edebiyatê, kesên derûdora xwe ji gelemşeyên jiyanê rizgar dike. Bi rêya lehengê xwe, fikrên xwe yên siyaset û felsefî digihîjîne xwendevanan (Tagızade, 2006, r. 10).

Binyada esasî ya realîzma sosyalîst, felsefe û îdeolojiya Marksîst e. Di berhemên afirînerên Marksîzmê, Marks û Engels, de digel ku li ser edebiyatê fikrên zêde tunene jî, dîsa di wê fikrê de ne ku guherîna şikl û naveroka berhemên hunerî bi guherîna civakê re hevyek e. Her wiha ji bo Marks û Engels edebiyat, ji bo têkoşîna îdeolojiyê giring e. Piştre ev fikr, ji gotara V. Lenîn ya bi navê "Teşkîlata Partiyê û Edebiyata Partiyê" re bû sermijar. Ev gotara ku ji bo weşanên partiyê hatibû nivîsîn, demekê bi şûn ve di warê edebiyat û hunerê de dibe "Binyada Teorîk" a polîtîkayên Partiya Komunîst a Sovyetê. Li gorî Lenîn, nivîskarê ku dixwaze rastiyê têbigihîje, ne tenê yê xwe, her wiha fikr û hestên derûdora xwe û civaka xwe jî nîşan dide. Loma li gorî Lenîn, edebiyateke serbixwe û bêalî ne mimkin e. Ev boçûn, dibe binyada têgihîştina/feraseta edebiyata Sovyetê û realîzma sosyalîst jî li gor vê fikrê tê sazkirin. Her wiha bingeha esasî ya vê têgehê jî, têgihiştina hunerî ya Marksîst-Lenînîst danî. Li gor vê "Huner pêwîstiyên civak, çîn, komên estetîk û cîvakî bi cih tîne, şikil dide dinyaya menewî ya ferdan, norm û fikrên ku ji paşila çandê derketine li ferdan belav dike (Tagızade, 2006, r. 10).

Realîzma sosyalîst ku bi Lenîn re di nav edebiyata Sovyetê de belav dibe, ne bi awayekî tundewarî û zordarî ye, lê di dewra desthilatdariya Stalîn de, Partiya Komunîst a Sovyetê rêyek tenê dide pêşiya nivîskaran, ku ew rê jî pesindayîna sîstema sosyalîzmê ye. Bi serkêşiya rêhevalê Stalin, Jdanov, edebiyateke partîperest tê avakirin (Moran, 2009, r. 52). Di hemû berheman de îdeolojiya sosyalîzm-komunîzmê serwer e. Yek ji armancên sereke ku tê qebûlkirin endazyariya civakî ye. Afirandina welatiyên nû yên Sovyetan cihê herî giring digre di vê îdeolojiyê de (Ahmedzade, 2011, r. 49). Ev yek, vê gotina nîvîskarê desthilatdariya Stalîn, Karl Redek piştrast dike ku wî di "Kongreya Diyarkirina Rê û Rêbazên Edebiyata Realîzma Sosyalîst" de wiha gotiye: Rastî, ne ew e ku tenê hilweşîna kapîtalîzmê û çanda wê ya rizandî nîşan bide, di heman demê de nîşandayîna civakeke nû û afirandina çîneke nû ye ku bi wê çînê çandeke nû jî bê afirandin (Moran, 2009, r. 54).

Li gorî realîzma sosyalîst, rastiya ku di hunerê de ye, rastiya civakî ye. Ev rastî, di nav pêşketina şoreşê de tê dîtin û ji bo pedagojiya çîna karker tê bikaranîn (Moran, 2009, r. 53). Lehengên vê edebiyatê, ku ji bo perwerdekirin û terbîyekirina welatiyan hatine afirandin, bi cewherên payebilind hatine dagirtin. Ev lehengên ku fezîleteke polîtîk nîşan didin, dibin rêberê rêya rast û mînakekî bêhempa ji bo gel (Alan, 2009, r. 197). Jdanov, dîsa di heman kongreyê de li ser vê yekê dibêje ku; divê edebiyata Sovyetê, bi lehengên erênî bê têrûtijekirin. Bila ev, wekî xeyaleke utopîk neyê dîtin. Lewra ev leheng, insanên paşerojeke plankirî ne (Moran, 2009, r. 61). Bêguman, realîzma sosyalîst, bi awayekî berbiçav, hunerê wekî amûreke siyasî dibîne ku divê hem rastiya niha nîşan bide hem jî plansaziya paşerojeke sosyalîst bike. Di vê çarçoveyê de, lehengên vê edebiyatê, bi taybetmendiyên îdeal û erênî, ne tenê refleksa civakê ne, her wiha mînakên pêşeng ên ji bo guhertinê ne. Armanca bingehîn ew e ku xwendevan, bi navgîniya hunerê, ji bo avakirina civaka nû ya sosyalîst bêne teşwîqkirin an jî perwerdekirin. Ji ber vê, em dikarin realîzma sosyalîst wekî rêbazeke perwedehiyê jî bi nav bikin.

2.2. Têkiliya Realîzma Sosyalîst bi Edebiyata Kurdî ya Sovyetê re

Edebiyata kurdî ya Sovyetê bi temamî li ser hîmên realîzma sosyalîst ava dibe. Di berhemên vê edebiyatê de, ji bo guherîna kurdên vê herêmê, nasnameyeke ku bi nirxên sosyalîzmê hatiye ristin, tê pêşkêşkirin (Yavuzer, 2020, r. 55). Ji ber rêgezên realîzma sosyalîst, berhemên vê edebiyatê, hewla guherîna civakê di xwe de dihundirînin. Armanca van berheman, helbet ne tenê avakirina pergaleke nû ya civakî ye. Bêguman ew şahidê rabirdûyê ne jî û bi qasî ku di van berheman de em serkeftina tîpên erênî dibînin, em binkeftin û pûçbûna tîpên neyînî jî dibînin (Yıldırımçakar, 2020, r. 156). Lewra li gorî rêgezên realîzma sosyalîst ev jî mecbûrîyetek e, ku xwendevan yanî civak têkeve nav wê baweriyê ku sosyalîzm hebe serkeftin heye, ji xeynî wê her binkeftin e.

Edebiyata kurdî ya Sovyetan, ne encamek vejîna neteweyî an jî pêşveçûnên çandî yên xwezayî ye. Ev edebiyat, di bin şert û mercên guncaw ên siyasî û civakî de, bi alîkariya dewletê, ji bo pêşketinê derfetan dibîne û berheman diafirîne, ku ev berhem jî, bi awayê fikrî, ji manîfestoya sosyalîzmê pir ne dûr in. Wekî nimûne em dikarin van berheman bi nav bikin, ên ku li nav Edebiyata Kurdî ya Sovyetê bi ruhê îdeolojiya Sosyalîzmê hatine nivîsîn û hişyarkirina gel ji xwe re kirine armanc; Romanên Erebê Şemo Şivanê Kurmanca, *Jiyana Bextewar*, *Hopo* û *Dimdim*, Romana *Hewarî* ya Heciyê Cindî, romana *Kurdê Rêwî* ya Sehîdê Îbo, romana *Bawerî* ya Ahmedê Hepo, romanên Eliyê Evdilrehman *Gundê Mêrxasan*, *Xatê Xanim*, Şer Li Çîya, romana *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo, romana *Fîncana Ferfûrîyê* ya Ezîzê Gerdenzerî.

3. Realîzma Sosyalîst û Minetdariya li Hemberî Sovyetan di Romanên Hopo û Jiyana Bextewar de

Ji ber ku Erebê Şemo, endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Ermenistanê bû, her du romanên xwe *Hopo* û *Jiyana Bextewar,* bi rê û rêbazên realîzma sosyalîst nivîsîne. Qewimîna bûyeran, teswîra dîmenan û qisetkirina vegêr elametên vê ekolê nîşan didin. Her wiha zimanê vegêran û romanê jî li gor vê ekolê hatiye dîzaynkirin. Ji ber ku cih, kes û bûyerên *Jiyana Bextewar* û *Hopo* hema hema bi temamî yek in, ev her du roman wekî berdewama hevdu tên nasîn. Bûyer, di *Jiyana Bextewar* de bi teswîrkirina jiyana êleke li Serhedê dest pê dikin. Ew êl, êla Sîpkan e ku endamên wê li gundê Entabê, di navbera çiyayên Sîpanê Xelat, Kosedax, Eledax û Dumanliyê de dijîn. Lê piştre ji ber zilma Romê, ew direvin xwe diavêjin bextê ûrisan. Li gorî wan ûris, ne zalim û ne kedxwer in. Dema leşkerên ûris, dikevin nav gund û tiştan ji gundiyan distînin, ne bi zorê lê bi pere ji wan distînin (Şemo, 1994, r. 36, 37, 122). Lê li Romê ne wiha bû. Paşayê Romê, bi destê milazim, qeymeqam, kûlak û axayên kurdan ên ji wan re bûne noker, neheqiyekê gelek mezin li gelê belengaz ê bêhêz û bêziman dike. Radibin tên bertil, xerc û xerecê bi zorê ji wan distînin û heta ji ber ku li mala wan xwarin xwarine, kirêya diranê xwe (dîş kîrasi) jî ji wan distînin (Celalî, 2014, r. 74).

Gava ku li derekê zilm û tehde hebe û li dereke din qencî û mirovatî hebe, wê demê mirov dikare berawirdiyekê, yan jî li gorî rewşê bijartinekê bike. Li gor vê daneyê, bijartina êla Sîpkan jî, bicihbûna li welatê ûrisan e. Lewra li welatê wan, zilm û zordariya axa û begên kedxwer her ku diçû zêdetir dibû, ji koçberiyê wê de tu rêyek li ber wan nemabû. Bi van bûyeran, têkiliya navbera kurd û ûrisan dest pê dike. Her wiha bi vê têkiliyê, hewildana nivîskar jî dest pê dike ku dilrehmî û dilsoziya ûrisên bolşevîk nîşan bide. Loma gelek caran em dibînin ku nivîskar dev ji vegotina mijarê berdide, dest bi pesindayîna sîstema sosyalîzmê dike. Vê yekê, carinan bi xwe, carinan jî bi devê lehengên xwe dike (Şemo, 1994, r. 119, 189-193, 204, 211, 214, 224). Ev pesindayîn, di *Hopo*yê de jî berdewam in. Kurd, bi saya artêşa sor azad bûne. Her wiha wefadariya welêt li ber dilê wan çêdibe, ku teqsîr nakin li hemberî faşîstan ruh û canê xwe bidin. Di vî "şerê weteniyê" de jin, ji bo zilamên xwe yên ku diçin şer, nagirîn, serûçavên xwe venarûn. Bereksê vê, ji ber ku mêrên wan dê ji bo "weten" şer bikin kêfxweş dibin (Şemo, 2007, r. 18, 50). Di destpêka romana *Jiyana Bextewar*ê de berawirdiya di

navbera romê (roma reş) û ûrisan de tê kirin, bi herikîna bûyeran re ku kurd koçberî Sovyetê dibin, ev dibe berawirdiya bolşevîk û molşevîk, karker û milkedaran. Carinan çardeh dewletên emperyalist ên Ewropî jî para xwe ji vê berawirdiyê distînin (Şemo, 1994, r. 164).

Li gorî sosyalîzmê perwerde, ji bo rêkûpêkiya mirovan pêwîst e. Perwerde nebe, ne mimkun e hînkirina îdeolojiyê bigihîje serî. Mistoyê di van her du romanan de, Ereb bi xwe ye ku ewil golikvanî û wergêriya zimanan dike, piştre dest bi xwendinê dike. Ew dê paşê jî bibe endamê Partiya Bolşevîkan, bixwîne, tezên Lenîn hîn bibe û ji miletê xwe re bixebite (Şemo, 1994, r. 154, 161). Xwendina ku bi Lenîn û bolşevîkan dikeve nav kurdan, dibe sedema hişyarbûnê. Di vê heyamê de dibistan vedibin, keç û xortên mîna Zînê, Hesen dibin xwende û ji gundên xwe re xizmetê dikin. Edetên berê yên xerab, wekî qelendayîn û bi zorê keç birin yan revandin ji holê radibin (Şemo, 2007, r. 246). Ew edeta ku, ji dêvla qelendekî mezin keçikeke ciwan bo zilamekî zewicandî, salmezin û têrpere dihat dayîn, kevin dibe. Mîna berê êdî xwediyê qîzan ne bav û birayên wan in ku wan bidine mêr; xwediyê qîzan Dîwana Sovyetê ye (Şemo, 2007, r. 124).

Erebê Şemo di *Hopo* û *Jiyana Bextewar* de fikreke gelemperî jî berovajî dike. Wekî ku tê zanîn kurd her tim bi dewletên serhikum re dijber bûn, lê di van her du romanên Şemo de em dibînin ku kurd dostên dewletê ne. Ew ji bo pêşketina komunîzm û Sovyetê bi dil û can dixebitin. Her wiha ji bo Sovyetê bi faşist, axa, milkedar, daşnak, emperyalîst û kapîtalîstan re şer dikin, dibin eskerê sor, dikujin, birîndar dibin û tên kuştin. Ew nahêlin zirar bigihêje dewletê. Lewra hemû hebûna wan bi saya komunîzmê pêk hatiye, bi wê pêş ketine û jiyana bextewar bi wê bûye para gelê kurd (Celalî, 2014, r. 75).

Di piraniya roman û çîrokên edebiyata kurdî ya Sovyetê de rewşa xerab a kurdan tê berbiçavkirin. Kurdên herêmê ji ber zilm û zordariya axa û began ji welatên xwe direvin û bi alîkariya ermen û ûrisan ji komkujiyê xelas dibin (Ergün, 2018, r. 808-811). Ji van berheman yeka ku mijareke bi vî awayî vedikole romana *Jiyana Bextewar* e. Ev berhem, romana Erebê Şemo ya duyemîn e. Ev roman, piştî sirgûna Ereb, di 1959an de hatiye çapkirin (Boyîk, 2019, r. 134). Ev di nav romanên Erebê Şemo de ya herî berfireh e. Nivîskar, mijara xwe ji jiyana êla Sîpkanê wergirtiye. Bûyerên dîrokî ji xwe re kiriye paşxane û li ser vê fonê jiyana kurdên herêma Serhedê û Sovyetê nîşan daye. Lehengê sereke Emerîk e û bûyerên sereke, li derûdora qedera malbeta wî û kurdên wê herêmê dizîvirin. Di encama tevliheviyên wê demê de malbata Emerîk û endamên êla Sîpkan, ji bêgaviyan direvin diçin welatê Sovyetê. Li dora çiyayê Elegezê, li nav kurdên ku beriya wan ji zilm û zordariyan reviyane, bi cî û war dibin (Boyîk, 2019, r. 134).

Wekî di *Şivanê Kurmanca* de, nivîskar, di vir de jî bi rêzikên realîzma sosyalist nêzîkî *bûyer û lehengên* xwe dibe. Ew, hewl dide ku nîşan bide lehengên wî yên erênî her tim serkeftî ne. Ew, bi heysiyet, bêqisûr, xebatkar, paqij û zana ne. Ji bo heqiyê, *pêşveçûyînê, edalet, dostanî û g*elên bindest şervaniyê dikin (Boyîk, 2019, r. 137). Ew, ne bi dilê xwe, lê bi hişê xwe yê îdeolojîk tev digerin. Di rewşên zehmet de jî, civaka xwe hêvîdar û bi cesaret dikin. Ew, tu caran ji armanca xwe û ji fikr û ramanên xwe dûr nakevin (Çoban, 2017, r. 122). Axa û milkdar jî ewqas zalim û tehdekar in ku, di dema xelayê de, wexta ku ji birçîna dest û lingên xelkê diwerimin û dimirin, jixwe li rewşa wan nafikirin, bi ser de jî dawetê digirin. Erebê Şemo, bi van hevokan axa û kedxwer mehkûm kirine:

> *Gava ku ji ber derê Resûl Axa bîna nanê petî û qeliyê kete nava gund, çend kesîb, jin û zarên birçî temûl nekirin, hatine ber mala wî. Ciyê qelî diqelandin dûr ve sekinîbûn stûyê xwe xwar kiribûn lê dinihêrîn. Waxtê te li wan meriyê birçî dinihêrî, ew pirçûkirî bûn, çavên wan çûbûne kort, dest û piyên wan werimîbûn. Ji dûr ve meriv tirê xurt bûne, hema ku meriv nêzîkî wan dibû, dihate xuyakirinê wekî ewana werimîne (Şemo, 1994, r. 55).*

Di *Jiyana Bextewar* de, kurd serê pêşî li welatê xwe yê eslî di nav tengasiyê de ne. Leşker, axa û

beg bi zilm û zorê pişta wan dişikînin. Piştî ku kurd ji ber zilma axa û milkdaran direvin, berê xwe didin welatê ûrisan, demeke din jî bi zehmetî û dijwariyên jiyanê re rû bi rû dimînin. Ji ber ku careke din xwe di nav şer de dibînin. Ev, şerê Bolşevîk û Monşevîkan e ku di dawiyê de Bolşevîk bi ser dikevin. Lê heta ku pergal diguhere jî, zilm û tehdeya heyî berdewam dike. Mîsal gava Sehîd û bavê xwe Emerîk ji bo xebata rojane diçin Tiflîsê, li wir, Sehîd ji hevalên xwe dibîne û cara yekem daxwaza xwendinê dikeve dilê wî, lê gotineke wiha xerab jê re tê gotin, ji alîyê xwedîyê pastexaneya ku tê da dixebite:

> *Wekî tu bixûnî, lê kê bixebite? Ancax pera qezenc kî xwe xweyî kî. Perê bavê te hene, wekî te bide ber xwendinê? Ji wê şûnda kurd gişk hemal in, xulam in û dergevan in, çi te, çi xwendin e (Şemo, 1994, r. 183).*

Ev gotin Sehîd diêşînin. Sehîd dilê xwe ji bavê xwe re jî vedike, bav wiha dibêje û bi gotinên bav re nîyeta nivîskar jî eşkere dibe:

> *Lao, xwendin tiştekî zef pak e, lê em nikarin ewqas pere destxin bidne heqê xwendinê. Tereqê me jî dibên: "Xwendin ji me ra gune ye" nizam çima hemû mileta ra ne gune ye, her me ra gune ye? Bi aqilê min ewê ku xwendinê ji me ra kiriye qedexe, ew dijminê me ye. Ewî çima ew tiştê pak kiriye qedexe?* (Şemo, 1994*, r. 183)*

Piştî ku Bolşevîk bi ser dikevin, Sovyet ava dibe, rêya xwendinê çawa heqê her gelî be, wisa dibe heqê kurdan jî. Daxwaza Sehîd tê cih. Ew jî wekî hevalên xwe yên ji miletên din dest bi xwendinê dike:

> *Ew meremê ku Sehîd ser bû, şev û ro li ser difikirî, lê ew çend sal bûn nedihate serî, îcar hate serî. Ewî jî her bi saya partiya bolşevîka. Ew partiya ku rê û hemû derge vekirin û hemû zehmetkêşa ra, usa jî vekir bona kurdêd zehmetkêş, ê gele sal û zemana çetinî û zelûliyê da bûn, bin nîrê siltanê Romê û şahê Îranê, usa jî bin nîrê bega, axa û şêxê milkedar (Şemo, 1994, r. 189).*

Eger em hinekî bala xwe bidinê, em ê bibînin ku Sehîd di jêhatîbûnê de bi temamî yekî mîna bavê xwe Emerîk e û hemû liv û tevgerên wî ji bo berjewendîyên Sovyetê ne. Ew, mînakê herî baş ê civaka xwe ye ku li gorî realîstên sosyalîst divê karakterên wiha hebin, ji ber ku ew ji bo dîzaynkirina civakê pêwîst in. Loma Sehîd gava ku wextê xebatê tê dixebite, gava ku şer tê ber derî (a rast şerê bi almanan re ji ber derîyê wî gelekî dûr e) bêyî tirs diçe şer. Ew, çawa ku di xwendin û xebata xwe de jêhatî ye, wisa di şer de jî jêhatî ye. Heta ewqasî jêhatî ye ku nav û dengê wî, tirs û xofê dixe dilê dijminên wî. Mîna ku "Cin ji hesin bitirsin" ji wî ditirsin (Şemo,1994, r. 248). Gava ku şer diqede û Sovyet bi ser dikeve, Sehîd mîna qehremanan tê pêşwazîkirin û xelatkirin, lê piştî çend rojan dîsa dest bi kar û xebata xwe ya gund dike. Lewra, divê em bala xwe bidinê, lehengên wekî Emerîk û Sehîd hema bêje qet nawestin, eger biwestin û nexweş bikevin jî qet nasekinin, helbet ev jî sebebek wê heye, ku ev sebeb jî bi îdeolojiya sosyalîzmê re rasterast têkildar e.

Hopo, romana Erebê Şemo ya dawîn e. Mirov dikare *Hopo*, wekî berdewama romana *Jiyana Bextewar* bihesibîne, ji ber ku lehengên sereke yên her du romanan yek in û mijar hevûdu temam dikin (Celalî, 2014, r. 73). *Lê Hopo*, berevajî her sê romanên Şemo yên din, li ser temaya aramî û kêfxweşiyê hatiye honandin. Di her sê romanên wî yên pêşîn de şer, pevçûn, şoreş, guherînên mezin, hilweşîn û hwd. hene, lê di vê romanê de bûyer kêm in. Şemo, di vê romanê de jiyana gundekî kurdan a di dema sosyalîzmê de vedigêre. Li gund, sîstema kolxozvaniyê hatiye avakirin û gundî bi awayekî serfiraz û jidil, di karên gund de dişixulin. Zilma beg, axa û şêxan ji holê rabûye. Jixwe serdema desthilatdariya wan qediyaye. Şerên mezin jî yên mîna şerên yekemîn û duyemîn ên cihanê li paş mane. Civak, di nav aramî û serfiraziyê de ye. Digel ji holêrabûna desthiladariya axa û began û hatina sîstema sosyalîzmê, di nav civakê de xwendin belav bûye. Ciwanên gundên kurdan diçin bajarên wekî Yêrêvan, Moskova û Tiflîsê, bi xwendina bilind mijûl dibin. Dibin endazyarê çandiniyê û hwd. û vedigerin gundê xwe.

Li gundê xwe di xebata kolxozê de dibin rêvebir. Gava ku mirov vê romanê dixwîne, mirov guherîna di nav civakê de bi awayekî berbiçav dibîne. Pergaleke nû ava bûye. Mercên jiyanê hêsan bûne. Gundî bi xwe dikin û bi xwe dixwin. Ji xaniyên bin erdê derketine. Di berhemanînê de teknîkên herî pêşketî bi kar tînin. Zarok tev dixwînin. Ji bo zarokên ku hîna naçin dibistanê bexçeyên zarokan hatine avakirin. Her wisa têkiliyên nav malbatê jî guherîne. Jin xwedî maf û rayê ne. Lehenga bi navê Zînê mînaka guherîn û pêşveçûna jinê ye. Ew keçeke sêwî ye, xwendiye û bûye endazyara çandiniyê û ji bo pêşveçûna gelê xwe ji dil û can dixebite (Boyîk, 2019, r. 138).

Şemo, bi vê romanê, wêneyê jiyana gundên kurdên li dora Çiyayê Elegezê kişandiye. Guherîn û pêşketina di civakê de hatiye qeydkirin. Xwezî û daxwaziyên ku wî di her sê romanên xwe yên pêşîn de ji bo jiyaneke bextewar ji bo gelê xwe dikir, di vê romanê de bi dest dikevin. Gelê wî jî, mîna her gelî azad dibe. Bi zimanê xwe dixwîne û keda xwe dide xwe. Loma ew her minetdarê vê pergalê û dîwana Sovyetê ne. Yek ji lehengên romanê, Morov, vê rewşê wiha nîşan dide:

- Werin em gişk kasên xwe vexwin eşqî Partiya Lenîn, eşqî Dîwana Sovêtê, ya ku azayî da me, em ji qetla Romê xelas kirin, ji destê wan axa, beg û miftexuran, ên ku em bi hesabekî bêpere ji xwe ra didane xebatê! Lê niha şikur hûn dibînin, em aza dijîn, êdî kesek me naşêlîne! Û niha gelek cahilêd me, ên mîna Zînê û Hesen, dixebitin, çêdikin emrê teze, çêdikin deb û edetên teze (Şemo, 2007, r. 259).

Bi rûniştina sîstema sosyalîzmê re, xwendeyên kurdan zêdetir dibin. Ciwanên kurd, li bajaran dixwînin û berê xwe didin gundê xwe da ku ji bo gundê xwe bixebitin, gundê xwe bi pêş bixin. Di *Hopo* de Hesen û Zînê, vî barî hildigirin ser milên xwe. Ew, piştî xwendina xwe dibin agronomê (muhendîsê zîreetê) gundê xwe. Bi dil û can dixebitin da ku gundê wan, miletê wan, dîwana Sovyetê bi pêş bikeve. Her wiha ew wekî qasidên dîwana Sovyetê ne, ku wekî mînakên baş ên vê pergalê li nav gel tên bicihkirin. Divê ew bi dil û can bixebitin, da ku gel jî çav li wan bikeve û wekî wan bixebite, bi vê jî hînê pergala sosyalîzmê bibe. Jixwe wisa jî dibe, lewra di romana *Hopo* da gundî her roj hinekî din zêdetir dixebitin û di rola karkeran a berhemanîna ji bo sosyalîzmê de, her carê hinekî din jêhatîtir dibin. Lê bereksê Hesen û Zînê, yên ku xwendina xwe kuta dikin û venagerin gundê xwe jî hene, ku ji van kesan yek jê hevalê Hesen, Letîf e. Letîf, di nameyeke xwe de, ku ji bo Hesen dişîne, ji Hesen dixwaze ku ew jî neçe gund, lê Hesen di bersiva xwe de van gotinan dibêje:

Ez dizanim tu yê bibêjî ezî şaş im. Lê ez ne şaş im, ew zanîna ku min stendiye, lazim e bidim gund… Letîf, hinek cahilên me ji gundan çûne şeheran, hînê xwendinê bûne û di şeher da hema wisa mane, êdî venagerin, nayên gund. Ji te tirê wan tiştekî pak kiriye? Tê bîra te, em çûn Moskovayê seyrangehê, me bi çavên xwe dît çiqas cahil komsomol, xwendekar, kur û keç diçûne Sibîryayê, Qazaxistanê û Altayê, ne li wan garan bi hezaran cahil bûn, ên ku diçûn bixebitin? Çima em jî ne komsomol in? (Şemo, 2007*, r. 87)*

Em dizanin ku di berhemên realîzma sosyalîst de, nivîskar dikevin rola endezyarîyê û bi devê karakterên xwe yan jî bi tevgerên wan, rê li ber civakê dixin. Di romana *Hopo* de xwendekarek û hevalekî mîna Letîf heye, ku ji nameyên di navbera wî û Hesen de em fam dikin, ew serê xwe bi rewşa civakê naêşîne û bi tenê li kêfa xwe dinêre, loma rastî bertekên tund ên Hesen tê. Di vê romanê da hebûna Letîf zerûrîyetek e. Li gorî rêgezên realîzma sosyalîst divê yekî wekî Letîf teqez hebe da ku xwendevan fikrên Hesen (a rast fikrên nivîskar û jê wêdetir polîtîkaya xebat û perwerdehîyê ya Sovyetan) ên der barê xebata piştî perwerdehîyê de bibihîzin.

Hesen di nameyeke din de, ku wê jî ji bo Zînê dişîne, zelalîya xwe ya der barê fikra xebata ji bo gund de xurt dike û di dawîya nameyê de vê wekî wezîfeyeke pir giring destnîşan dike:

…Ez çawa komsomol im, wekî gaziya partiyê neqedînim, neçim gundêd me kurdan, li kê dere zanîna ku min bi saya partî û dîwana Sovêtê standiye, niha gelekî lazim e, bidim gundê me.(Şemo, 2007, r. 73)

Helbet em dizanin ev name, her çiqas Hesen nivîsîbe jî, bersiveke din ya nivîskar e, ji bo fikrên

neyînî ên vê der barê de.

Di romana *Hopo* de, gundî di kar û xebata gund de wekhev dixebitin û alîkariya hev dikin. Her kes, li gorî tecrûbe û karîna xwe wezîfeyekê digire û dixebite. Hin jê dibin şivan, hin jê dibin cotkar, hin jî dibin çêlekdoş û bêrîvan. Kar û mehsûl jî wekî xebatê, bi parvekirinê tê kirin, yên ku pir xebitîbin, heqdestê xwe pirtir distînin. Loma her kes ji dil û can dixebite. Heta hinek ji wan, rojên xwe yên berê yên xerab tînin bîra xwe, şukir dikin û bêtir dixebitin.

Bêguman tişta ku nivîskar di vê romanê de dixwaze bide îspatkirin ev e; îmkanên ku bi dest ketine, ji ber xwe ve çê nebûne, yê ku van îmkan dane, milet ji şer û pevçûnan xelas kirine, di nav mexlûqet de aramî û sukûnet ava kiriye û bûye muxatabê şikur û diayan ji xeynî Lenîn û partiya wî, ne kesekî din in.

- Şukir ji partiya Lenîn r*a; kê bawer dikir wê wexteke wisa bê, wekî kurê kurdan jî hînê maşîneke wisa bibe, a ku xwe bi xwe di riyan da here û ji ga, hespan, deveyan jî zûtir here, şukir…(*Şemo, 2007*, r. 27).*

Loma lehengên romanên E. Şemo, mîna ku di nav ayînekê de bin, hema bêje di her sohbetê de rojên berê bi bîr tînin û ji bo halê xwe yê niha şikur dikin, paşê spasîya xwe li Lenîn û dîwana Sovyetê dikin. Helbet, nivîskar vê berawirdîya ku bi devê lehengan her tim tîne pêşîya me, bi hêvîya armancekê dike, ku ew jî ji ruhê edebiyata realîzma sosyalîst pê ve ne tiştekî din e. Li gor vî ruhî di nav edebiyatê de, gava ku behsa dema berê bê kirin, ji xeynî tunebûnê, bêguman her tiştê berê divê kevn û perîtî be, bereksê vê, her tişta nû û nûjen jî divê "niha" hebe. Bêguman divê "hebe". Lewra "hebûn" dîwarekî bilind ê edebiyata Sovyetê ye, ku nivîskarên vê edebiyatê gelek caran pala xwe dayê. Helbet afirîner û xwedîyê vê "hebûn"ê jî, li gor van nivîskaran, ji dîwana Sovyetê pê ve ne kesekî din e:

Lê wextê tarî kete erdê, li ezmanê şîn tiji stêyrk bûn, cahil ji hev bela bûn, her kes ber bi mala xwe çû. Meriyê kal man. Wana derheqa xebata kolxozê da xeberdida, wekî bi maşînê xebat çiqas zû dibe, xebata kolxozvana çiqas sivik kirine. Wê êvarê wana xebata berê û yê niha anegorî hev dikirin: Wextê bi cotê darîn zevî radikirin, wextê bi dasa, melendiya û kêlendiya giha û nan didrûtin, wextê bi kama nan dikutan: cote ga kamê da girêdayî, sibê heta êvarê ber tava havinêye germ, merî diqijlîn, serî li merîya dibû mînanî "dew'. Wextê wana ceh tenê li erdê diçandin, hine sal ew ceh surê dibir, şîn nedibû. Bedo digot:

- Lê icar? Îcar maşînê erdê diqelêşe, cot dike, gihê û nan didrû, nan dikute, hemû xebatê rind, temiz û zû jî dike. Tê bira we, berê cem me xên ji ceh, tiştek şîn nedibû, lê niha bi ulmê agronomiyê genimê kirik û bostanê kartola, gizêra, pîvaza û silqa şîn dibe (Şemo, 1994, r. 219).

Encam

Erebê Şemo, hem ji aliyê edebî hem jî ji aliyê sîyasî ve kesayetekî giring e. Ew di romanên xwe *Hopo* û *Jiyana Bextewar de,* bi rêbaza realîzma sosyalîst, jiyana kurdên Sovyetê û guherînên civakî yên ku bi şoreşa sosyalîst re pêk hatine, bi awayekî berbiçav vedigêre. Ew, di van her du berhemên xwe de, ne tenê çand û hunera kurdî nîşan dide, her wiha minetdariya gelê kurd li hemberî Sovyetan û pergala sosyalîst jî tîne ziman. Bi karakterên xwe yên wekî Emerîk, Sehîd, Hesen û Zînê mînaka "insanên nû yên Sovyetê" pêşkêş dike. Ev karakterên ku bi taybetîyên realîzma sosyalîst hatine afirandin û ji bo pêşketina civakê û pergala sosyalîst bi dil û can dixebitin û fedakariyan dikin, di nav edebiyata kurdî ya Sovyetê de wekî prototîp cih digirin.

Hopo û *Jiyana Bextewar,* her çiqas ji aliyê arşîvên folklora kurdî ve, wekî çavkaniyên giranbiha bên dîtin jî, diyar e ku ev berhem, rasterast temsîlkariya realîzma sosyalîst dikin. Ji ber ku bi armanca bernameya polîtîk a edebî hatine nivîsandin û bi awayekî sîstematîk, şikirdarî, minetdarî û spasiya ji bo Sovyetê dihundirînin. Her wiha, ev her du roman, ji bo detnîşankirina jiyana nû -emrê teze- hatine

nivîsîn, ku ev jiyana nû, li gorî Erebê Şemo, bi saya dîwana Sovyetê çê bûye. Di van her du romanan de, ev jiyana nû, wekî muqayese li hemberî dema berê, ku di wê demê de her tim şer, pevçûn û birçîtî hebû, hatiye nîşandan.

Bi tevayî, *Hopo* û *Jiyana Bextewar*, ne tenê ji bo dîroka edebiyata kurdî, her wiha ji bo dîroka civakî û siyasî ya kurdên Sovyetê jî du çavkaniyên giring in. Her du roman, bi rêbazên realîzma sosyalîst, nîşan didin ku Sovyet ji bo kurdan bûye cihê rizgarî û pêşketinê. Her wiha, kurd, bi saya Sovyetan ji zilm û zordariya axa û began rizgar bûne, ji bo pêşketina xwe û pergala sosyalîst bi dil û can xebitîne û bi kêfxweşî jiyane.

Çavkanî | References

Ahmedzade, H. (2011). *Romana kurdî û nasname*, wer. Fahriye Adsay. Avesta.

Alakom, R. (1991). *Kürdolojî biliminin 200 y*ıllık *geçmişi (1787-1987),* Deng.

Alan, R. (2009). *Bendname.* Avesta.

Boyîk, E. (2019). Çanda *kurdên sovêtê.* Peywend.

Boyîk, E. (2014). Rojnameya riya teze. *Nûbihar*, 126 (Jimara Taybet), 9-15.

Celalî, M. (2014). Di romanên Erebê Şemo Jiyana Bextewar û Hopo de: Tîpên şoreşger ên romantik, *Nûbihar*, 126 (Jimara Taybet), 72-76.

Çoban, B. (2017). Lehengên erênî û şoreşger di romanên kurdî yên sovyeta berê de, *Wêje û Rexne*, 9/10, 105-124.

Ergün, Z. (2017). Ducemseriya realîzma sosyalîst di romanên Erebê Şemo û Heciyê Cindî de, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, 9(2), 644-661.

Ergün, Z. (2018a). Fonksiyonên hevbeş û zincîreya rûdanê di vegêrana edebiyata kurdî ya sovyetê de. *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, 10(3), 805-818.

Ergün, Z. (2018b). Taybetiyên vegêrana edebiyata kurdî ya sovyetê. *Mukaddime*, 9(1), 133-150.

Ergün, Z. (2022). Emerîkê Serdar: Dengekî ciyawaz di edebiyata kurdî ya sovyetê de, *Mukaddime*, 13(1), 147-169.

Moran, B. (2009). *Edebiyat kuramları ve eleştiri*. İletişim.

Reşan, N. G. (2008). *Navdarên kurd*. Doz.

Şamil, H. (2005). *Diaspora k*ürtleri. Perî

Şemo, E. (1994). *Jiyana bextewar*. Deng.

Şemo, E. (2007). *Hopo*. Lîs.

Şemo, E. (2009). *Şivanê Kurmanca*. Lîs.

Tagızade, L. (2006). Sosyalist realizm: Kökeni, oluşum süreci ve kavramı. *Modern Türklük Araştırmaları Dergisi,* 3(4), 7-24.

Xelîl, T. (2014). *Antologiya 35 helbestvan û nivîskarên kurd ên sovyeta bere*. Na.

Yavuzer, M. N. (2020). Panoramaya nasnameya neteweyî di romana Êwra Kavkazê de (1935-1991). dnd. *Destpêka romana kurdî*. Edt. M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, Peywend. 49-78.

Yıldırımçakar, M. (2020). Bi perspektîfa hînwerîya lehengên erênî tîpê şoreşger ê rûs di romana kurdê rêwî ya sehîdê îbo de. dnd. *Destpêka romana kurdî*. Edt. M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, Peywend. 155-169.

EXTENDED SUMMARY

The global political and economic upheavals that intensified in the 18th century led to a world war in the early 19th century, engulfing the Middle East and the Caucasus. During this period, the Serhat region, where Kurds predominantly lived, and the Caucasus region, which today has almost no Kurdish population, faced severe social and political instability due to prolonged wars between the Ottoman Empire and the Russian Empire, followed by the world war. This spiral of violence ended with the Russian Empire's withdrawal from World War I and the establishment of the Union of Soviet Socialist Republics (USSR), resulting from popular movements and internal conflicts. The old system based on bourgeois dominance was abandoned, and a new governance approach that gave voice to the working class and peasants was adopted, initiating a process of social and cultural reconstruction. During this period, reforms were implemented in education, culture, and the economy, particularly targeting workers, peasants, and minority nations who had been neglected during the imperial era.

Thanks to these socialist-based reforms, Kurdish youth, mostly studying in Soviet republics such as Armenia, Azerbaijan, and Georgia, opened the door to a new literary movement with the help of Armenian intellectuals and writers fluent in Kurdish. Hundreds of literary works were produced, Kurdish-language schools were established, theater groups were formed, Kurdish newspapers (the most famous being *Rêya Teze*) began publication, and Kurdish-language broadcasts were aired on state radio. Countless works were created, serving as archives for Kurdish language, literature, and culture. Among the writers contributing to this archive was Erebê Şemo, a prominent writer and intellectual who authored the novels *Hopo* and *Jiyana Bextewar* using the method of Socialist Realism, the subject of our article. Erebê Şemo published his first novel, Şivanê Kurmanca (The Kurdish Shepherd), in Yerevan in 1935, which was also the first novel in Kurdish literature. In 1937, due to the deteriorating political atmosphere in the Soviet Union, he was exiled to Siberia by Stalin's order, along with thousands of others. He returned from exile in 1955 when the political climate changed again and resumed his literary work. Despite 19 years of exile, Şemo, who had joined the Bolsheviks from the beginning of the October Revolution and dedicated his life to socialism, continued to write his works in line with this purpose. In his works, he praised the new order brought by the revolution through his characters and expressed gratitude to V. Lenin and the Soviet Communist Party for establishing this system.

Erebê Şemo wrote his novels *Hopo* and *Jiyana Bextewar* using the method of Socialist Realism, as did other Soviet writers. This method, which became the official policy of the Soviet Union in the 1930s, posits that literature and all other disciplines derive their strength from the economy and are therefore obligated to reflect societal realities. Writers and artists who adopted this method viewed their works as tools for social development, assuming the role of politicians rather than mere creators, and used their skills to praise the revolution and Marxism, the foundation of Socialist Realism. The old and the new were compared, and the benefits of socialism were championed. The bourgeoisie and feudal structures and methods were condemned, while epics and songs were composed in honor of the working class, including peasants and workers.

The novels *Hopo* and *Jiyana Bextewar* bear all the hallmarks of Socialist Realism. The plot, dialogues between characters, visual descriptions, and the narrator's style all support these traces. The complementary narrative styles, plots, settings, and characters of the two novels further reinforce this. In *Jiyana Bextewar*, Şemo focuses on members of the Sipkan tribe, who fled the wars and turmoil in the Serhat region in the early 19th century and sought refuge in the Elegez (Alagöz) region of Armenia under Russian military control. According to the novel, while the tribe members, who had previously lived under Ottoman rule in the Serhat region, faced oppression and humiliation by authorities, law enforcement, and wealthy landowners, they found some relief after migrating to areas

controlled by Russian soldiers. However, their struggles continued. The working-class, laborer, and peasant protagonists of the novel, who joined the Bolsheviks in their struggle against the Mensheviks, became staunch supporters of the "New Life" brought by socialism after the revolution. In *Hopo*, this new life post-revolution is described in detail, contrasting the "bad" old ways with the "good" new ones. Through the novel's characters, gratitude is expressed to V. Lenin and the Soviet Communist Party for opening the doors to this new and peaceful life, enabling their educational and economic development. Unlike Şemo's other novels, *Hopo* does not focus on war and conflict but rather on the recovery and reconstruction process of a Kurdish village brought to life by socialism. As a result, the plot is less event-driven, with more emphasis on descriptions, and the characters are educated and calmer. Weapons have been replaced by pens and notebooks, young people who can read and write have emerged, oppressive customs restricting equality and justice have been abandoned, and a new system of communal living and working has begun to take shape.